Di şeva Krîsmesê de!

Îsa, yek ji zarokên Birahîm, li gorî salnameya Katolîk a Romayê, di şevek mîna îşev du hezar û bîst û sê sal berê de hat dinê. Îsa Cihûyekî bi ol bû û di demeke taybetî de ji dayik bû. Di wê demê de cîhan di navbera du polên totemîzma Roma û Mazdaîzma Eşkenazî de hatibû parvekirin…

Erdê ku Îsa lê ji dayik bû, parêzgeha Cihûstanê(Yehuda) li Şamê Mezin, ji aliyê Romayîyan ve hatibû dagirkirin. Şervanên Eşkenazî ku bi latînî jê re Partî tê gotin, kevandaran û şerkerên jêhatî bûn ku Romayî li Kîlîkyayê an jî li dervayî Firatê rawestandibûn. Di sala 53 berî zayînê de jî di şerê Herranê de arteşa serleşkerê mezin ê Romê Krassus têk birin û li Zaxo yê ew jî kuştin. Navê serokê artêşa Eşkenazî Soran û navê împaratorê Eşkenazî jî Harûte bû.

Eşkenaziyên Bahi Dîn bi xwezayê dewreş bûn û xwedî baweriyên sofiyan bûn. Por û rihên xwe drêj dikir û ji xwe re digotin parêzvan û leşkerên Mardux.

Mardux di kevneşopiya Îbranî de Mîkaîl û di kevneşopiya Mendaî de Melka tê gotin. Kurdên misilman jê re dibêjin Mell û Mare an jî Mehre. Kurdên cihû ku bi Aramî diaxivin jê re dibêjin Mellke. Kurdên Êzidî jê re dibêjin Tawsê Melek.

Mardux (Merdux, Kardux, Patrux, Patruk, Partuk, Xumurd, Gumurd, Keyumers, Kurdux, Kurduwa, Kurdu, Partow, Partuwe, Şurupak, Şurawa, Şuyder, Uşîder, Derwêş, Şurîde, Jupiter, Patriot, Atrupat, Partîwe, Perdîwe, Artumat, Artîmat, Mattîra, Mîtra, Mehre, Pîtra, Pîter, Peder, Şupîter)... Îzeda afirandin û parêzerê edalet û evîn, peyman, kevneşopiya wêrekî, lehengî û hevaltiyê ye.

Padîşahiya Eşkenazi di sedsala yekem a berî zayînê de ji bo herêmên peravên rojhilatê yên Deryaya Navîn pir hestiyar bû ji ber ku di serdema Kûreşê Mezin de ew yek ji herêmên grêdayî padîşahiya duyemîn a Mîdyayê bû. Bi wî rengî tevahiya Rojhilata Navîn û Misir di bin desthilatdariya Marduxîyan yanî, Karduxîyan an jî Kurdan de bû.

Lê Îskenderê Makedonî Rojhilata Navîn zevt kir û Impraturyeta Dehukiyên duhem wêran kir, piştî 90 salan gelê Eşkenazî Marduxî, bi rêberiya Rizgarker(Ereşke) ku bi xwe atropatê agirê pîroz ê Xaweran (Rojhilat) bû, dest bi vegerandina kontrola axa xwe kirin ku di dema qelandina Împeratoriya Dehokê ya Duyemîn(Dehukiyên II,Mîdyaye II), ji aliyê Îskenderê Mezin ve hatibû dagirkirin.

Lê niha Romîya wek serokên nû yên Ewrûpayê hatibûn Rojhilata Navîn. Ew hatibûn ku dîrokê dubare bikin û xwe bigihînin Hindistanê, û vê carê Eşkenazî Karduxî bi hêz û yekgirtî bûn û Romîya rawestandbun û heta generalê hukmdarê sûrî Krassus kuştin. Sedema duyem a hesasiyeta împaratorê Eşkenazî ji bo Şamê ew bû ku Şamê mezin pira navbera padîşahiyê bi Kartaca, Misir û Qibrisê ve girê dida... Lê Romîyan bi hêz li Sûriyê birêve dibirin. Cihûyên Yehudayê, Lubnanê û Sameryayê bi hevrêyên xwe yên Kurdên Eşkenazî re gelekî yekgirtî bûn da ku zimanê wan ê danûstandinê Aramî bû.

Cihûyên Îsraêl ne bi Îbranî, lê bi Aramî, wekî zimanê îdarî yê xelkê welatê Eşkenazî Karduxî yan jî Kurdistana kevnarê diaxivîn... Kurdên kevnar bi zimanên Mîdya (Atrupatî, Mayî) û Palle (Palluyî) diaxivîn. Bi rastî, her du ziman zaravayên heman zimanî ne. Lê belê, peyvên Aramî bêhtir dihatin bikaranîn di Palluyî yê da û Alfabeya Palluyî ji Aramî hatiye wergirtin, lê alfabeya Atrupatîk bi awayê Hîroglîf û Bizmarî bûye. Bi serdestîya Palluyên

Eşkenazî re, alfabeya Atrupatî an jî Mayî ku ji aliyê Magî an Atrupatan ve li bajarê pîroz “Xaweran” dihat bikaranîn, bû Aramî.

Zmanê Atrupatî, zmanê olî û Aristrokrasî û zmanê Palluyî zmanê leşkerî û diplomasîyê bû.

Aramî jî kurdîya kevnar e, hemû zaravayên kurdîya nûjen û asûriya kevnar tê de hene. Bi awayekî xwezayî, kulturê Eşkenazî bandoreke mezin li ser çanda Îsraîlî û Lubnanî kiriye. Împaratorê Eşkenazî ferman da waliyê Hedîabenê(Hewlêr) ku di dema dorpêçkirina Galîlê ji aliye Romaiyan ve ku heft mehan domand, lojîstîk, çek û malzemeyan bişîne bajarê Galîl ê Îsraîl .

Bîr u baweriyên mîstîk ên Marduxî li tevahiya Rojhilata Navîn a kevnar belav bû. Ev hegemonya bi hezaran salan hebu, lê di serdema Eşkenazî Marduxîyê de bi hêza neteweyî û siyasî ve girêdayî bû.

Di dema şerê Romayê de felsefeya Marduxî li Îsraîl û herêmên ji Firatê wêdetir bi ramanên azadîxwazî, dadperwerî û li dijî biyanperestiyê xwe nîşan da. Ew her tim li benda derketina serokekî nû bûn, wek Atrupatê Xaweran, bi hêvî bûn ku herêmên dagirkirî yên li rojavayê Feratê ji Anatolyayê heta Çola Sînayê vegerînin Împaratoriya Eşkenazî û rêya pîroz a Urşelîm-Herran-Xaweran vejînin.

Tengîwer, Yapall û Wermiz, sê Şexs an Kose an zanayên xelkê Xaweran(Rojhelata Pîroz), stêrka Bêtlêhêmê dîtin û meraq man û biryar dan ku li pey wê biçin. Sê mêr li sê deve siwar bûn (deveyên Seqizê navdar bûn) û li pey stêrkê çûn, dema ku ew ber bi rojava ve diçû heta ku ew giha parêzgeha Yehuda û gundê Bêtlêhêmê, û li cihê ku stêrk rawestiya, wan malbatek ji sê kesan dîtin: Dê û baveke genc û zarokek.

Her sê Şexsan ji hevjîna ciwan re gotin ku kurê wan dê bibe Kose yê Îsraîl, lê divê jiyana wî xilas bikin... Zarokê pitik Îsa axivî û got: Axa we Xaweran dê bibe navenda şaristanî û pêşketinê di paşeroja dûr de.

Belê, kehaneta Îsayê Naserî rast derket û sed roj berê, dema ku di 15ê Îlona 2022an de, xelkê vî bajarî li ser gora Jîna Amînî ku laşê wê nû hatibû veşartin, dirûşma Jin Jiyan Azadî qîr kirin, dilan kirin, û li çepikan xistin... reftareke ku di çanda şîna Îslamî de qet nayê şopandin. Ji ber ku Îslam nahêle jin beşdarî merasîma cenaze bibin, an jî çemerî yê(Dîlana taybetî gencên mirî) bikin, li çepikan bidin û çarşev ji ser jinan rakin.

Piştî merasîma cenazeyê Jîna Amînî, xelkê vî bajarî li navenda bajarê Seqizê dest bi serhildanê kirin û di encamê de 2 ciwan hatin kuştin, hinek jî birîndar bûn û gelek jî hatin girtin. Piştî çend demjmêran xelkê Sine yê tevlî serhildanê bûn û Tehranê jî di heman şevê de dest bi serhildanê kir.

Piştî serhildanên wan sê bajaran, li Mazenderan, Îsfehan, Reşt, Kirmaşan, Tewrez, Erdebîl û 130 bajarên Îranê, serhildan bi awayekî giştî girt u heya niha dewam dike.

Di wê rojê de serokê Amerîkayê ku li baregeha UNê mêvan bû, xemgîniya xwe ji kuştina Jînayê anî ziman û rejîma Îranê şermezar kir... Almanya, Brîtanya, Fransa, Îsraîl, Kanada, Zelanda Nû, Awustralya û gelek welatên din helwêsta serokkomarê Emerîkayê şopand û bertek nîşan da li hemberî vê bûyera tehl û her wiha serhildana giştî ya şermezarkirina rejîma Îranê.

Li ser gora Jînyê bi kurdî hatibû nivîsandin: Jîna can! Navê te dê bibe sembol.

Sembola li vir tê wateya azadiyê... jiyan... jin... şiyarbûn û hişmendiya mêran... guhertineke mezin a civakî.

Ez Kahên(Atrupat, Şuyder, Şurîde, Derweş, Zînduta, Suşîyant, Maşîyeh)ê agirê Xaweranê ji Bakurê Ewrûpayê ve, rêzê dikim ji hemû kesên ku bi vê sembolê bawer dikin.

Keleha Agirê Xaweranê nemaye ji ber ku di Sibat û Adara 1988'an de ji aliyê Pasdarên Şoreşa Îranê ve bi hinceta avakirina penageha şerê hate rûxandin. Erdên mayî hatin firotin û xelk li wir xanî çêkirin.

Ji bîr nekin ku ev agir di dilê me de zindî ye... ji ber ku bîranîna afirandinê ye û bîranîna derketina rojê ya yekem e... Ev agir sembola evîna Xusraw Parwêz û Şarê û sembola evîna navbera mêrê yekem (Xetu, Ataxwa, Ataxma, Xat, Xwate, Xwade, Xwedi, Xedîw, Xiwace) bi jina xwe (Eya, Aye, Eda, Daye) re û sembola evîna Atrupatan ji Atrupatê yekem ra (Yam, May, Pak, Mag, Mex, Beg, Bex, Perîwe, Peruta, Peruzer) heta Atrupatê dawîn (Zînduta) Ji bo Xwedayê Afirînerê Hebûn û Tunebûnê, Qeder, Ruhê nemir, Navika afirandinê, mezintirîn Îzed û hêzê ezmanî, ango Mîkaîl(Mardux).

Ez li ser dînê Pakê me. Ola Pak bi tevahî bi nemiriya ruh û pergala Padaşt û Cezakirina mirov di dema jiyana wî ya li cîhana îroyîn û jiyana piştî mirinê de bawer dike. Ola Pak bi bawerî bi mafê bijartinê û îradeya azad ji bo mirovan bawer dike, lê hişyar dike ku her bijartina azad a ku mirov di pratîkê de bike encamên baş û nebaş ji bo mirov heye. Meriv xwedî azadiyên takekesî ne, lê ji ber têgeha jiyana civakî, azadiyên ferdî yên mirov ji aliyê qanûnên medenî ve ji bo afirandin, parastin û berfirehkirina nîzama giştî ya civakê û ewlehiya civakî û her wiha ji bo bidestxistina pêşkeftinên madî, bextewarî yên mezintir têne diyarkirin û ewlehiya derûnî.

Rojbûna Mardux, Sersala Mîtra ya 6377, Rojbûna Îsa, Cejna Sersala 2023 û Henûka yê Îbranî 5782 li we gelê Kurd û bawermendên Îranî pîroz dikim.

Cihê mixabiniyê ye ku ez di vê dema tehl de hatim dinê û mezin bûye û ez gihîştim vî temenî û ez bûm şahidê bextreşiya nifşên piştî xwe, lê Xwedayê mezin mizgînî daye min ku rojekê ev tehliya bi dawî bibin. Ez ê wê rojê bibînim, hûn jî wê bibînin.

Dema ku ez we dibînim, ew deme ku em hemî azadiya axa Xaweran dibînin. Rizgarkirina xaka Rojhilat (Xaweran) wê bi tîn û germa agirê dilê we gelê dîrokî pêk were.

Mamosteyê min Şurupak Zerdeşt du hezar û heftsed û pêncî sal berê ev roj pêşbînî kiribû... ji ber ku Xwedê hişt ku ew vê razê fam bike û vê pêşbîniyê ji gelên vê zemanê re bihêle. Bawer bin, ev soza Xwedê ye û bêguman wê pêk were. Di Roja Azadiyê de, ez ê tiştên din ên xweş eşkere bikim ku dê ji we û mirovên cîhanê re dilxweş bike.

Bê guman, frehî û kar u qencî têde heye.

Mamosteyê min Xidr î Zînde (Xidr Şa yê Zîndû) kurê Şa Surîca û neviyê Şa Gawara ye.

Di zimanê kurdî yê Atrupatî de ji zilamen olî re Şexs û Kose, Keşîş tê gotin... Di nivîsên Zerdeştî yên dawî de jê re Usîxş û Xşe, Keşîş tê gotin. Yarsanî jê re dibêjin Sultan. Di zimanê xelkê vê serdemê de bi deshelatdar dibêjin Şa, lê Şa bi eslê xiwe de wek zilamê olîyê payêbilind hatiye vexwendin.

Xidr î Zinde an Şurupagê dûyemîn ji hêla Anû û Enlil ve jiyana herheyî hate dayîn. Mardux an Şurupagê yekemîn ew jî wek her mirovî li vê dinyayê da jiyandin. Lê parêzgerê asîman Anû û parêzgerê bayên bahozê Enlîl ew pîroz kirin û nemir kirin ji ber ku wî nifşê mirovan, heywan û nebatan ji lehîyê mezin parast. Ev bahoz duwanzdeh hezar sal berê qewimî.

Xidr Şa yê jîndar hukumdarê Kur-Dîlmun(Çar-Derî) û Atrupat ê Xaweran û hukmdarê xanedana Kaşpî ya Sumerî (Şagiga, Kaşîşu, Şukaşu, Kuşî, Kaşî, Kasî, Sekasî, Sekî, Sagzî, Sakastanî, Eşkî, Eşkuzî, Eşkenazî)bû.

Piştî tofanê nejada merivan li Kur-Dîlmun û Mezopotamyayê pêş ket û Sumeriyên Duyem, Elamî, Gudtî, Hûrî, Lûlûpî û Akadî li Rojhilata Navîn derketin holê.

Yên ku li Kur Dîlmunê man û ser bi xanedana Xidr Şa ve bun û diviyabû bibin Atrupatên agirê Xaweran(Rojhilat), bi navên Peg, Meg, Beg, Pat, Mad,Med, Mey, May menşûr bûn.

Ew bi navên Kur Dîlmuni, Kar Dîlmunî, Kardulî, Kaldurî, Kaldunî, Xaldunî, Xaldî, Gardunî, Kaldanî, Çardunî, Çardewlî, Çardurî û Çardinya dihatin naskirin.

Sernavê padîşahiya Kaşîyên Babîlan di hezarsala duyemîn a B.Z. de jî Kar-Dunî bû… Ew Ji aliyê Hîtîtan ve hatin tunekirin.

Ev sernav hatiye ji bo xaka Xaweran a ku çar deriyên xwezayî lê hebûn: Sê derîyên avê û deriyê çaremîn, tîrêjê rojhilat, ji aliyê rojhilat ve li herêmê vedibe. Sembola Kar-Duni xaçeke ku her tim dizivre, jê re Çerx tê gotin.

Çerxa gerdûna agirîn a Îzedê Tîr a serwer a gerstêrka zer an jî Mercury bi nîşana pisîka reş û zer û birca Kevjalê bû.

Çerx ji aliyê Yekane an Berazê Wehram ve dihat kişandin. Ev beraz şeraba sor a tiriyên axa Xaweran û spektruma yekem a tîrêjên spî yên tavê, ku jê re Ultraviolet(Jorî Binevş) tê gotin, nîşan dide. Navên Yam, May, Yîw, Hîwa, Mey, Cemşîd, Perham, Behram, Wehram, Werehram, Werterxen, Awram, Abram, Awraham, Merîx û Mars.

Rêyên avîyên Kar Dunî an Çar Dniya ji hêla Hane an Estêr, Îzdê parêzgerê yên avên ser erdê ve têne birêve kirin.

Lê belê, berevajî mirovên nezan û ne zana ên ku bi xerabî behsa May an Mey dikin û wê wekî xirap û qrêj bi nav dikin, kesên weha wekhevîya navên mîtologî, Îzedan, pêxemberan û împaratorên dîrokî nizanin û ew di wê baweriyê de ne ku Zerdeşt bi şermezarkirina May an Cemşîd Şa dijberiya Abraham, bavê Cihûyan dike û çîroka Murdexay û Xaman wekî delîl nîşan dide.

Ew nizanin ku Estêr, Murdexay, Padîşah Xoşedere, hukimdarê Dehukîyên II, Murdexay Cihû û Karduxî hemî yek olî bûn. Xaman(Wehaman, Makan, Behmen) ji pozîsyona xwe ditirsiya û Murdexayê(Kardux, Mardux, Kurde) Cihûyê Mîtrayî (Eşkenazî Karduxî Palluyî) xwedî baweriyê Mîkaîlî û Sufiyane ye, lê Xaman dijminatiya Sufiyan dike. Împratorekî wek Xusrew Newşirwan ê Sasanî ev dijminatiya sûfiyan hebû. Îslam dijminê vî sûfîgeriyê ye. Yewnan û Rûm dijminên vê sûfîzmê bûn. Ferox Ramses (Fîrewn) jî dijminê vê sufîzmê bû. Mellayên Fêrisî û Sedûqî jî dijminên vê sûfîzmê bûn heta ku Îsa dan kuştinê. Ji ber ku Îsa wek Xidr Şa, Abraham, Mûsa, Dawid û Şmûyîlê bawermendekî sûfî bû... Her wisa Zerdeşt, Manî, Mezdek, Sultan Sehak, Şêx Edî, Behaullah, Şêx Evdilqadir Geylanî, Baba Tahir Waryanî û Mewlana Xalid jî vê koma sofiyan bûn.

Ji bo mînak: Çend meh berê melayekî sunnî heqaret li Evdilqadir Geylanî kiribû.

Melayên Selefî û Îxwan al Muslemîn, komeke îslamî ya radîkal û xwedî baweriyên dijwar e, dijminatiya sûfîzmê ye. Ew welatên ku piştgirîya vê ramanê dikin, gelek pere xerc dikin ji bo perwerdekirina melayan û belavkirina wan li Kurdistanê û ji navbirina rehên mîstîk ên Marduxî yê

Kurd û bi tunekirina vê tesewufê, kesayeta dîrokî û netewî ya Kurdan ji holê radikin.

Ez şîretan li kurdên cîhanê dikim ku tu carî rehên ola Merduxî ji bîr nekin û vê çanda ku min di van du salên borî de ji we re vejandiye biparêzin.

Ez ji we daxwaz dikim ku hûn vê çandê di jiyana xwe ya rojane de bi kar bînin, ji ber ku raz û sembola mayîndebûna nasnameya neteweyî ya kurd wek "Kurdê Kurdistanî" di van nivîsan de ye.

Tu carî bêhurmetiyê nedin Cihû, Xiristiyan, Yarsanî, Êzidî, Mendayî, Behayî û Zerdeştî. Ew mîratgirên dînê Kurda yê resen Marduxîne.

Ez ji kurdên misilman re şîret dikim ku nekevin pey melayên şîe û sunnî. Çimkî ew çanda xapandinê, girî, bêhêziyê u teslîm, tirsa ji pêşerojê û mentiqê "Bi qasî ku dikarî bibe û birevîne"pêşdixin, ji ber ku ew ji paşeroja tiştekî ne bawerin.

Ji ber vê yekê ew tirsonek, kevneperest, çavbirçî, pare qrêj, pozbilind, xapînok, çavnebar, zordar, çirûstî, bêrehm, nefsok û şehvetçîne.

Ez ji we gelê Kurd û ji wan Îraniyên ku li pey van fikrên derew û faşîstî neçûne daxwaz dikim ku derewan nekin û çavê xwe li kesî nekin, reşbînî û şikên zêde, dibe bêhilwestî û ehmeqî, tu carî xeletiyek wiha nekin. Cih û rûmeta xwe bizanibin û xwe neden cihê kesî, lê hewl bidin ku girîngiya kesayetî û mantiqa hebûna xwe fam bikin, lê bizanibin ku li cîhanê sîstemeke hiyerarşîk (mezin û biçûk) heye û her kes di wî de cîhek ji xwe re peyda dike.

Her tim hurmeta mezinên xwe bigirin. Ji dinyayê û jiyanê hez bikin û hewl bidin ku rewşa xwe ya madî û derûnî baştir bikin. Rêz bigrin û pêş ve bixin

çand û diyardeyên wê, weke (wêje, huner, antropolojî, civaknasî, arkeolojî û dîrok) bigre.

Ji nasnameya xwe hez bikin û rêz bigirin. Nekevin nav tora faşîzmê, ji ber ku meriv ewil bibî wek ehmeqekî, paşê bibe wek nêrgizanekî, paşê jî wek merivekî êrişkar û destdrêj derdikeve û herî dawî jî wê dinyayê li dijî we bicivîne.

Li ser lingên xwe bisekinin, bibin yek û rêzê li nasnameya kesên din bigirin.

Li bendê bin ku dijmin tîra yekem biavêje…Dema ku we dest bi şer kir, heya ku hûn dijmin hilweşînin berdewam bikin.

Rêgezên rêz bigirin.

Zimanê Kurdî biparêzin. Berpirsiyariya we ye ku hûn ax , cugrafî û çavkaniyên Kurdistanê biparêzin. Ji rengên Sor, Zer, Binevş, Kelleqazî(Teal), Gewr, Kesk, Şîn, Erxewanî, û Pîrozeyî re rêz bigirin ji ber ku ew dewlemendî û pirbûnê sembolîze dikin. Lalê Spî (Spinel) sembola Xaweranê ye, rêz jê bigirin. Ji Keska Sorê re rêz bikin ji ber kû nişana soz û qirarê Xudêye bi Xidr Şaye Zindî re.

Li dijî rejîma Îranê heta ku wê rejîma faşist bê rûxandin berdewam bin.

Dijminên derdora xwe paşguh nekin.

Xwedê we bihêle!

Atrupat ê Xaweran, Şurîde yê Eşkenazî (Azad Kerîmî)

Çarê meha Cûday ê di sala 6377ên Mîtrayî de

Norwêc, Skandînavya, Ewropaya Bakur

Şeva 25ê Kanûnê 2022

Nivîsa Îngilîzî ya vê gotarê jî dê were weşandin.